

evîn û enfal

— evîn û enfal

— Roman

— Hesên îbrahîm

— Derhênana hunerî: Govhid umer

Pêşgotin.

ev qelemê niho ez vî berhemü pê dinivîsim.

Berî çar roja, min dengê xwe li ser lista dengdanê pê da.

Li roja 7 / 3 / 2010 . Min û gelek kesan, dengê xwe bi azadî bo perlemanê îraqê da.

Min dengê xwe da wê lista wî kesê min vîyay.

Bi vî qelemî, ewê niho ez vî berhemü pê dinivîsim, min nûnerê xwe helbijart. da carekadî li welatê min azad û jîyan, tûşî enfalkirinê nebin.

Bi vî qelemî, min hewil da, welatê xwe ji enfalkirinê biparêzim.

Û dê her bi wî qelemî, berperekî, ji deftera enfalên rhiş nivîsim. herçhîde çu kes û çu qelem rhişên hovatî û dirindatiya enfalan tomar bikin.

eve dê tinê hewlek bit, da nevyên min û yên azad û jîyanê, bizanin, ka çi hatîye serê bab û kalên wan.

hîvîdarim, min şîya bit, hîdek rhişatyê bêxîme ser rûyê rhişê enfalçîyan.

Hesên îbrahîm 11/ 3 / 2010 nûrnberg elmanîya

Diyarî:

Bo her kesê jibo nanî xûnê dirêjit.

Jibo zanistî domê dikêşt.

Bo azadiyê, gerdana xwe di xilfa sêdarê dihilkêşt...!

Gelîyê agir pêve

Dengê top û moşekan, hêdî hêdî kê m dibû.

hirêna firokên şerker û çekên sivik, hêştta ya dijwar bû.

Firokên semtî, xwe berdidane serê çîya û nava gelîyan.

Serbazan wek xerzê kulî, xwe berdidane nehal û nav tiraşanda.

her kesê bilivî. her gîyanewerê xwe aşkira bikî. Bisedan bomb û şêlkên kilaşînkofa liser serî dibarîn.

Berxwedan nema. hîvî binax bûn. Jîyan gelek ji mirinê taltir lê hat.

Agir jikavle gundan bilind bû. Qêryên jin û zaroyan tijî gelî bûn.

Kom kom, gundî ji nav tiraş û şkefî û bin beran, kêşane wê nehala vala.

Çekdar lipêş çavên gundîya gollebaran kirin. Jin û zaro, kom kirine dizîlên lhişkerî yên amade da û berev xwarê birin.

Li serê her rêyekê, karwanekî nû yê zîlên tijî jin û zaro, digehşte koma wan.

Jibinê çîyayê agir pêve ,heta dhiştê, karwanê zîlên lhişkerî û tjî jin û zaro, ketin dûv êk. hewar û girî. Kuştin û kirêtkirin bedewame.

Dengê berpîrsên wan bilind dibû.

- malê wan. Gîyanê wan. Namûsa wan bo me helale .enfale ,enfal...

Gund sotin, pîr waş û kanî, herfandin. Malê wan û gîyanê wan talankirin.

her jidestpêkê û libinê çîyay, zêlam cuda. Jin û zaro cudakirin.

hemû pêkve berev cîhaneka nedîyar birin. Kesê ageh jizaro û bira û kes û karên xwe nema. her kes tinê dizanî, ew yê dijî, da biçavên xwe dozexa dojminî bibînit. herkes yê diserê xweda, dawîya xwe divehînit. hemû baş dizanin, dawîya wan nemane, kirêtkirine, bisaxî binax kirine.

Gotinên wan kesan dihatine bîra wan. Dema basê wan gundîya dikirin, ewên berî wan ketîne destên dojminî, heta nihu diberzene. Kes jê nezivirîye.

- yên nêr, bi saxî binax kirin.

_ yên mê, kirêtkirin û kirine (sebaya).

_ zaro, vhişartin. Firotime dewlemhidên hevalên xwe.

_ ey hewar.... eve çî hate serê me?! Ma em ne mirovin?! Maem ne bendên wî xwedayîne ,ewê ew diperêsin?!

Jigiryê û jîhewara zaroyan. Kesê nedşîya gelek hizira bikit.

Torbêl, liderê gelî, jiber rêya teng û jiber piraniya Zîlan. Ketin beramberî êk.

Serê xwe bilind kir. Çavên xwe yên tijî tirs û rondik, libabê xwe gêran.

Çu nêr nedîtin. hemû jin û zarone.

Torbêl, nêzîkî êk bûn. Teniştên wan mane pêkve.

Çavên wê, ketin çavên wî yên şîn.

Tirs jibîrkir, deng û girîya jin û zaroya, nehate guhan.

Li ser wê ferman û kuştara hovanera, bişkurînê lêvên wê girtin.

Serinca wî kêşa. Serê xwe jinav tirs û hizira bilind kir.

Çavên xwe likesekî nîyas linav zîlê gêran.

Çavên wê şîyan, çavên wî şor bikine mêyatîya xwe.

Torbêl, rawestîyan. Çavên wan ketin êk. Şer û sotin û talan û kuştin li pişt xwe hêlan.

Çavên wan gelek digel êk axivtin.

Torbêla dane rê. Çav li dûv sêra torbêla çûn. Tirumbêl jêkvebûn. Jêk dûr ketin. Çav her digel çavan diaxivtin.

Rêya dûr, wastîyan û tirs û bîrs û dojminê har û bê dil.

Liêvareka direng, hemû li kelha nizarkê, kom kirin...

Kelha nizarkê

Karwanê zîlên lhişkerî yên tijî mirov, liber dergehê kelha nizarkê rawestîyan.

Kelha nizarkê, dikevte rojavayê bajêrê dihokê. Avahîyekî mezin û asêye. Dikoşa nihalekê da, dûr ji bajêrî. Gelek guneh û tawan lê diêne kirin. eve çend rojekin, ya bûye bingehê lhişkerî. Serbaz tijî hemû cihane. Mêvanên kelhê gelekî. Berî wan çend karwan îna bûn. Cih nema mêvan lê rûnin.

Wek gorgên bîrsî û har. Lhişkerî qesta karwanê zîlên jinû hatîn kirin.

Siwar bû, havêtine xwarê. Dane ber qontaxên çekên xwe. Wek pezê bû serbirîne amade kirî. Linîva hewşa kelhê digel yên berî wan komkirin. Lhişkerî wek kutanê durên wan girtin.

Biriyar hate dan. Dîsan koma wan têkve bidin. Nîvmêr û herzekar û zelumên li ser xwe jê bigirin

Wek volkanê, dengê jin û zaroyan bilind bû. hewarên wan esman kun kirin.

her kesê zaroyekî deh duwazde salî hey. Li bin kirasê xwe vhişart.

Şer bidest û çavan digel dojminê çekdar kirin. Gorepana kelhê, bû volkana mirovan. Agir û kerb û kîn jinavçavên jinan dibarî.

Kesê ageh jihevalê xwe nema. Kesê ageh jijîyana xwe nema.

herkesî divîya berî hevalê xwe bimirt. hemüyan divîyan. Berî kurên xwe, mêrê xwe, birayên xwe. Li pêş çavên xwe dinav xwîna wan da bibînit. ew bimirt.

Zelaman. Xwe aşkira dikirin. Da zû çavên wan bineqînin. Da ew çav, jina xwe, kiça xwe dayka xwe xwüşka kirêtkirî nebînin.

Şerê bê wijdanîyê harbû. Şerê bênamosîyê dijwar bû.

hemü şengstên mirovayetiye hatine têkdan. Şervan hovin. Armanc qirkirina tevayî ye.

Serkirdên cihanê liser kinarên derîya û di hotêlên hevît stêr ve. Yarî bikezyên zerên zarvekerên ciwan dikin.

hest û berceste neman, bînahî,şêlî bû, goh giran bûn.

Destê xwe havête milê wî û kêşa nik xweve.

Dilê wî jitirsa rawestiya, pîstê wî spî bû. hest kir ew jî kete tora dojminî.

Çavên wan ketin êk. Nhişîyan çu hizira bikin. Nhişîyan wesa bimînin.

_ xwe vhişêre. Dê te bin!

Axivtin jibîrkir. Tirs jibîrkir.

Pistoka wî kêşa, çemande axê.

_ xwe starbike. Yê lizelaman digerin!

_ ma dê xwe likûve vhişêrim?!

_ were, digel min were.

Dinav koma jinên wek aşorayê xwe diqotin da berzekir. Dibin ebayê pîrejnekê ve. Parzînkê bimilê xweve, vekir, kirasekê xwe înader. havête ser milên wî û kire ber. Dersokeka rhiş diserî girêda.

Jiber pirça wî ya dirêj, ü çavên wî yên şîn, ü pîstê wî yê spî. Wek kiçeka çardasalî xûya dikir.

Lewndyên wî lipişt girêdan. Destê wî girt, bire cihê dayka wê lê.

_ gelek negere, ne axive. Da kes çu gomanê nebit.

Tirsa wî zêde bû. Xwe kire qormik dinav kirasê diber bejna xweda, li ber teniştaya wê rûnişt.

Çavên wan ketin êk.

_ tû bêjî ez aşkira nevim?!

_ heker tû jiber teniştaya min neçî. Tû aşkira nabî.

Xwe pitir nêzikî wê kir.

_ supas bo te.

_ nedemê supasiyane. Xwe kerbike.

Xwe kire dinav koma wan jinên dinav ebayên rhiş da berze bûyn ü hewarên wan diçine ber esmanan.

Serbaz har bûn. Ketine dinav koma wan. Bipeştalan dane ser kelexên jin ü zaro ü pîr ü nesaxan. herkesê bêhna mêranyê jê dihat. Birine nîva gorepanê û li pêş çavên dayk ü jin ü zaroyên wan dane ber bilok ü kefiran. Şerê nîyandirtalan digel kirin.

hidek pîremêrên dil sotî. Bigopalên xwe, berevanî jikur ü nevyên xwe dikirin.

ewjî dane ber pestal û qontaxên çekên xwe. Li pêş çavên jin ü zaroyên wan. Li ser piştê rakêşane nîva gorepanê. Milên wan dane êk, berê çekên xwe dane sîngê wan yên tijî kul û keser.

hêştaya geleka şehde nedayn. Şêlka golleyên kilaşînkufan, singên wan disimtin.

Dengê şêlka kilaşînkufa, digel hewara jin û zaroyan têkel dibû. Tirs dikete dilê dojminî. Lezdikirin, kelexên wan berze dikirin. Carekadî li niv mêran digerîyan.

Gelek ji wan enî girê û lêv deqan. Dinav koma jinan da digerîyan. ewa bidilê wan ba, milê wê digirtin, dibirine cihekî nepenî. hewarên wan gohên bab û birayên wan dibin bilokan da digezandin.

Çend carekê, serbazek nêzikî wan dibû, yan destê xwe dirêj dikire jinekê.

hewil dida, rabite ser xwe, bersîngê wî bigirt ü tif bikite enîya wî ya rhiş.

hevala wî dizanî agirê dilê wî dijware. Milê wî digirt, ne dihêla rabit.

_ xwe ne livîne. Dê te nîyasîn.

_ ez har bûm. ez nhişêm xwe bigirim.

_ hişbe. Nedemê mêranyê ye. Kesê çu pê çê nabit. Xwe stare bike.

Nhişîya xwe licihê xwe bigirt. Çav diserî da sor bûn. enîya wî tijî xwh bû.

Didanên wî şerdikirin. Zanî, çu pê çê nabit.

Şelê xwe jibin kirsê liber xwe kêşa der. Wek kiçekê xûya kir. Xwe dinîva jinanda berze kir.

Tirs ü dojminê bê dil. Lez li şevê kirin. Kun ü qulaçên kelha nizarkê tijî tarî kirin.

Birs û wastîyan jibîr kirin. Tijî mejîyên wan bêhna xwîna lawên wan bû.

Hewşa kelhê wek kotana pezî, tijî jin û zarone. Wek vîstevalên hidosîyan. Zêmar û hewarin.

Diwan jorên tarî ve. Dengê lêdan ü qotan ü nalîna zelaman, cih yê kirîe dozex.

Xew, bûbû xewneka kirêt. Xewin, bûbûn kabûsên har.

Xwîna kuştî û birîndaran, bûbû tirîyak. Şanên mejîyên wan diazirandin.

hemü dinavbera xewê û xewin û rastîyê da hişik bûbûn. hest bi çu nedikirin. Goh liçu nedibûn. Çu bînahî nedidîtin. hemü bûbûn. Peyker.

Şerê êk layî dijwar bû. Gorgên har. ew mîhên bê desthelat, dixendiqandin, dilên wan dikirine dû parçe ü qesta mîheka dî dikirin.

ew jor ü ew kolan û ew gorepan. Tijî kelex kirin. Şev jitirsa revî. Roj, jitirsa zer bû.

Ronahî tijî kelhê bû. Kerb ü kîna gorgan zêde bû. Carekadî, dinav da gerîyan.

Zaroyên sinê, pîremêrên liserxwe. Jê girtin ü birin.

Jin ü zaroyên sava.

Cuda lizilên lhişkerî siwarkirin.

ew kelexên şivêdî jilêdan ü qotanê gîyanên xwe jidest dayn. Bidizîve bin axkirin.

Kelha nizarkê ji mirovan vala bû. Lê şerekî bê wijdan ü berxwedaneka bê omêd, bi xwîna mêvanên wê hatbû nexşandin.

Xelkê dihokê, ji xeweka giran hişîyar bûn.

ew dîmenên bi çavên xwe yên tijî xew didîtin. Bawernedikirin.

Wesa hizir kirin, eve xewneka girane .eve kabûsekê dirindeye. Dê bite spêde û dê hişîyar bine ser rastîya jîyanê.

Rêzika zîlên lhişkerî, nîva bajêrê dihokê kelaştin. Li pêş çavên dihokîyan. Xelkê wan, jin û zaroyên wan. Namûsa wan, malê wan. Talan kirin.

Roj bilind bû. Dinîya ron bû. hêştta dilê wan dixeweka giranda bû. Dengê kirêtkirina kiçên sinêla nedgehişte gohên wan. Dengê Nalîn û hewarên zelaman dibin qotan û lêdanê ve nedgehişte gohên wan.

Li wê roja eyniyê, mizgevtên dihokê tijî nivêjker bûbûn.

Melayên dihokê, bîreweryên (ebu hureyre) û mêranyên (Xalidê kurê welîd)î bû hejarên dihokê hizar bare dikirin...

Bajêr ma nivîsitî. Karwanê zîlên lhişkerî berev xwarê çûn...

Serbazgeha selamyê.

(roja êkê)

Turmbêlên leşkerî rêz bûne nîva gorepana serbazgeha seamlamyê.

Serbazên har. Siwarbûyên turmbêlan dane ber pestall û qontaxên çekên xwe û havêtine xwarê.

hewarên jin û zaroyan, tijî dinîyayê bûn. Wek pezê spî, her hidek dakirine diholeka mezin ya çînkûy.

her lidestpêkê, zelumên mayne sax coda birin. Dergeh lê hatine girtin. hêdî hêdî,volkana mirovan dahat.Birs û tirs wastîyanê.hemü mexel kirine ser wê çîmentûya gerim.

Mejîyê ron, dilên har, hişîyarkirin. herkesê licihê xwe, pirsîyara berzebûyên xwe kirin.

hemüyan dizanî, zelumên wan nazivirin! hemüyan biçavên xwe dîtin çawa didane ber bilok keviran! hemü vî dojminî baş dinîyasin!

Linîva hola mezin, serên xwe dane êk. Wek aşorayê, bitep û mistan ser û ranên xwe diqotan.

Wek serxweşan.hişên wan kom bûn. Zanîn likîvene! Zanîn çi hatîe serê wan!
Zanîn dê çi ête rêya wan!

Diwê gavê da divîya şeş dest heban. Da her sê kiçên xwe pê bidite ber sîngê xwe.

Liser milê xwe zivirî. Çar kiç dîtin.

Devê xwe bire bin gohê kiça xweya mezin.

_ eve kîye digel te?

Kiça wê jinav pêlên tirsê derkete nav agirê pirsîyareka dijwar.

_ ew kiçeke, jigundê lipîşt çîyay ya berzebûy.

Milê wê girt. Kêşa nik xweve.

_ tu kiça kêy?

Kiça wê bersiv da.

_ jitirsan neşêt baxivit.

Dayka wê destê xwe biserîda vemalî.

_ ya heqe, kiça min. em hemü jitirsa dê dîn ü har bin.

Xwe kire qormik, dersoka xwe baş dibin gohên xwera şidand. Kirasê xwe kire çeper.

_ nuke mala wê lê digerin!

_ nene, kes jimala wan nehatîe girtin.

_ ew çewa?! Pa çi lê hatîne?!

Devê xwe bire bin gohê dayka xwe.

_ babê wê, yê hatîe koştin. Dayka wê digel dû bira yên revîn, xwe xilas kirin.

_ pa ew çawa kete destên van? Bû digel wan nedçû?!

_ ew li hidav serê bapîrê xwe yê nesax bû. Neşîyan birevin.

Carekadî, dayka wê destê xwe dana ser milî ü kêşa nik xweve.

_ heyla rebenê. Nuke agir didilê dayka wê daye!

Maçek liserê wê da.

_ netirse, tu jî kiça minî. Çi bête serê me ,ew dê ête serê te. Man û jîyan pêkive.

Lêvên wî tijî bişkurîn bûn.

_ navê te çîye?!

Kiça wê bilez bersiv da.

_ ê... Ê.. Navê wê evîne ...evîn.

Dayka wê berê xwe da kiça xwe.

_ eve çîye? Tu ya bûye ezmanê wê? Ma ew ya lale? Tu bo nahêlî ew bersiva min bidit?!

Careka dî, devê xwe bire bin gohê dayika xwe. Dengê xwe nizim kir.

_ ma min ne gote te! Jitirsa ya lal bûy!

Destê xwe dana ser serê wî.

_ netirse kiça min. Dê ew bit ya xwedê vîyay....!

herduwa serên xwe dane êk. Tijî dêmên wan bişkurîn bû.

her zû dayka wê bişkurîna wan kire tirs.

_ da bo hewe bêjim. eve dojminekê bê namûse. Jinav mirovan dûr nekevin. Jicihên xwe dûr nekevin.hûn yên bûyne nîv jin.

Kiça wê bi tinê bersiv da.

_ bila dayê.

_ dê werin, birex min ve, xwe dirêj bikin. Ka dê çi ête serê me.

Bî pist pista wê.

_ xwedê xêr bikit... Xwedê lihewara me bêt...

herduwa xwe bi rex daykê ve dirêj kirin. Teniştên wan mane pêkve .hestên wan hişiyarkir.Bilez xwe jêk dûr kirin. hest bi cudahiya endamên leşê xwe kirin.

Çavê dayka wê bi kirasê diber hevala wê ket.

_ eve ne kirasê teye diber wê?!

_ belê dayê. Kirasê wê birêve kete tiraşekê û dirîya. hejarê mabû rûs...

_ bila kiça min, xwedê jite razî bit.

Jitirs û hizirkirina paşerojê. Çu gomanan diserê dayka wê da cih ne digirtin.

Dîmenê mêrê wê yê dinav xwîna wî da, jipêş çava ne diçû nedşîya çu hizira bikit, çav lê tarî bûbûn. Qêrî û hewarên mêrê wê û yên zelaman. Tijî mejîyê wê bûbûn.

Cihê çu hizir û bîrkinê nemabû. Wek nesaxeka deronî. hişên wê aloz bûbûn.

Cihê teng,herdû neçar kirin, milên xwe pêkvenin. her çendekê, dayka wan digot:

_ xwe nêzîkî êk bikin, da kes ne ête dinav meda.

her cih teng dibû, her şidandina milên wan zêde dibû. Tezîlanik biser lhişê wan da diçû. ew hola mezin tijî deng û girî û Nalîne. Tirs û birs digel taryê. Cih şir kirin. Dengê girîya hidek zaroyên sava. Leq li lhişên wastîyayî didan. Birsê xew jiçavên wan didizî. Gewryên wan, jigirîya da kul bûbûn. Xwîn ji hinavên wan diza...

ew hola tijî kelexên nîv mirî. her çendekê, liqêrîya jinekê, zaroyekî. Yan dihewara bilindbûna gîyanê birîndarekî, hişîyar dibûn.

Liser milê xwe zivirî. hevala wî, çavên wê dizîqin.

_ xewa te na êt?

_ ez newêrim binivim.

_ jiber çi tu newêrî binivî?

_ ez hest dikim nihu dê serbazek êt û te wek hemü zelaman bit, li pêş çavên min te dite ber bilok û keviran.

_ te got, wek hemü zelaman. ez jiwan çêtir nînim. Xozî ez jî digel wan bam.

_ xwe stare bike, nedemê van gotinaye.

_ tû dizanî, ez gelek şerim dikim? Min xwe dinav cilkên jinanda veşartî, û zelumên me hemü birin, kes nizanit ka çi lê kirin?!

_ wenebêje. Te çu pê çê nabit bo wan bikî. Dojmin yê hare. Xwe stare kirin, xebate.

_ ez jî wek wan zelumim. Bila min jî bikujin....

_ xwe star bike. Dibit rojekê tu bişêy tola wan vekî. Li wî demî dê zanî, ew kirasê li ber bejnate, bihayê wê çende?!

her weku bo xwe diaxivit.

_ heta kengî ev kirase dê diber min bit?!

Berê xwe da çavên wî.

_ çîye? Kirasê min ne bi dilê teye?

Çavên wî ketin çavên wê.

_ nene, bawerbike, sebira min gelek pê diêt.

Dilê wê tena bû.

_ tu dizanî, ez gelek hez jivî kirasê xwe dikim?

_ netirse .ez çi lê nakim!

Bi kenîeka çivêl.

_ gelek ji bejna te diêt?

enîya wî bû girê.

_ supas... Tu jî yariya bi min bike. Tu heqî!

Milê xwe bi milê wî ve şidand.

_ bawer bike, kes nizanit tu kurî!

hest bi germatîya milê wê kir.

_ wesa dîyare, ez dê kuratîya xwe jidest dim.

Axînkek rahêla...

_ dê bime kiç...

Serê xwe bilind kir. Çavên wê ketin çavên wî.

_ ma çi kêmasî likiçane?! Ma kiç ne mirovin?!

Dikûratîya dilê xweda diaxivit.

_ kur û kiç... Kiç û kur... hemû bo mirinê ne .hemû bo kirêtkirinê ne .heker mirovî welat nebit.

_ hişbe ,eve ne dem û cihên van suhbetane.

Divîya jinav hizirên wî yên aloz derbêxt.

_ hişîyar be, dayka min gelek berê xwe didite navçavên te!

_ erê, jiber wan müyên di rîyên minra dîyar.

_ dersoka xwe baş diserê xwe ü bin hefka xwe bişidîne.

_ ax, ax... heta kengî?!

Dengê xwe kire pistepist. Devê xwe bire bin gohî.

_ wesa dîyare te nevêt linik me bimînî!

Berê xwe da cihê dengî. Çavên wî bidu çavên reş ketin.

_ min divêt. Lê wek kur.

Dilê wê xwe zêde quta.

_ bêhna xwe fireh bike. Dê her çareyek hebit.

Dengê vekirina dergehî. ew kelexên mirî, kirine volkan. hemü hişîyar kirine ser rastîeka dijwar.

hewar ü girî ü qêryên jin û zaroyan. Digel hewar û girîya mêvanên nû têkel bûn.

Birekadî ya jin û zaroyan, hildane jor. Dergeh hate girtin. Deng kêmbû. her kes, liberzebûyên xwe gerîyan. Pirsîyar bûne gazinde. Gazinde bûne kerb ü kîn. Kerb ü kîn bûne. Kul û keser. Kul ü keser bûne. Kelexên bê gîyan. Kelex liser çîmentûya req, bûne peyker.

Cih teng bû, xew nema.

Xwe qolpande ser tenîştê. Çavên wan ketin êk.

_ xewa min na êt.

_ xewa kesê naêt.

Dêmê wî yê spî, çavên wî yên şîn, pora wî ya gewir, xwîna wî ya şîrîn. Dilê wê êxsîr kir.

_ rastîya xwe bo min bêje. Ka malbata te?!

Çavên wê yên reş, dêmê wê yê geş, pora wê ya dirêj. Sîngê wê yê biçûk. Tirs û mirin jibîra wî dibirin.

_ wek te gotî. Babê min lipêş çavên min şehîd kirin. Dayka min digel birayê min yê biçûk, li mal nebûn.

_ nuke dayka te lite digert. Nuke tijî dilê wê agire.

_ erê... heker disax bin. heker ew jî nehatbine girtin.

_ ne, xwedê wê nekit. Mate negot. Çûbûne dixiturî?

_ belê, lê niza ka çi hate serê wan? Ka kîve çûn?

_ netirse, deng ü basên vê şalawê, li hemü ciha dibelav bûn. Nuke xwe parastîne.

_ ax... Dê çewa cabekê gehînimê?!

_ bêhna xwe fireh bike. Dê her çareyek hebit. Bila kes nizanit tu yê livêrê. heker dê wan jî toş kî.

_ raste .eve gurgin. Mirov xwerin.

_ hema digel mebe, jîyan û mirin pêkive...

Çavên wan ketin êk.

_ sozê bide min. Tû me nehêlî.

_ jîyan ü mirin pêkive. Soz bit...

Tijî dêmê wê yê spî keîf û bişkorîn bû.

Milên xwe pitir pêkive şidandin.

_ erê te navê min kire evîn? Pa navê te çîye?!

Bi kenîeka şîrîn.

_ navê min jîyane.

herdû jidil kenîn...

_ û navê te yê dirust çîye?!

_ navê min azade.

_ azad û evîn... herdû gelek dixoşin.

_ jîyan jî gelek xoş nave.

Divîya pitir xwe bisteh bikit, pitir nêzîkî xwe bikit.

_ navê min bidilê teye?!

_ gelek xoş nave... Jîyan... Jîyan, dijî mirinê ye.

Wê jî divîya wek wî xwe şareza bikit.

_ azad jî xoş nave. Azad... Azad, dijî bin destyê ye.

hest bişermê kir.

_ raste, azadê neazad. Azadê dinav kirasê kiçekê da xwe veşartî.

_ tu gelek ji kirasê min yê torey, ez dê nihu ji berte kim.

_ piştî min şelê xwe havêtî? Dê mînme rüs!

_ bila... Da tu bihayê kirasê min bizanî!

Berê xwe da kirasê diber xwe. Destên xwe bilind kirin. Lewendyên kirasî şor bûn.

Bêy çavên xwe ji lewendîya vekit.

_ tu dizanî, ez gelek hez ji lewendyên kiça dikim?

Şerim ji rûyên wî dibarî.

_ dê bo xwe têr yarîya pê bike,hosa bidest te nakevit.

Destê xwe havête lewendîya kirasê xwe, dinav destê xweda kire gilomçik.

Berê xwe da paxlên xwe,divala bûn. Berê xwe da paxlên hevala xwe jîyanê. Wek dû hêka xûya dikirin.

Çavên xwe şor kirin.

Jîyanê zanî yê litişteki digert.

_ çîye? Te lewendî divên û te...

Kenî û şermê ser ji axivtina wê stand. Rûyên herduwa jişerma sor bûn.

_ heker te bivêt, bo xwe hindek pata bike dipaxla xweda...?!

Azad, jişermada, rengê wî spî bû. Qotana dilê wî zêde bû.

Jîyanê divîya pitir yarîya pê bikit, da rastîya dilê wî bizanît.

_ da tu yarîya pê bikî, wek lewendîya...

ew gilumçka lewendîyê, ewa didestî da xwhê day, havêt.

Serê xwe şorkir jişermada, piştta xwe dayê.

Jîyanê zanî vê carê, sinur bezandin.

_ bibore ,ez suhbetê dikim.

her zû lê zivirî.

_ borîn pê nevêt. ez dizanim tu suhbetê dikî.

Çavên wan ketin êk. Tirs û birs û nexoşî jibîr kirin.

Pêkive bilind bûn. Dinav mêrg û bîstanên gundên xweda bûne pelatînik, digel kew û kûvî û xezalan yarî dikirin.

Dinav gul û gîya da, xwe diveşartin.

Jipişt darmêwekê, xwe havête pişt darberûyekê. Xwe lihevalê xwe vedişart. heta diwastîyan. Qesta kanîya gundî dikirin.Pêkive xwe dihavêtine kanyê. Kenî û yaryên wan, kewên kurik liser hêkên gerim radikirin.

Girîya zaroyên birisî. Nalîna birîndar û nesaxan. Xew û xewin dikirine helim û lihindiv serên wan bilind dikirine banê wê hola mezin.

Wastîyan û xew. Bûne êk. Birs û nexoşî bûne êk.

Neşîyan çavên gelek pîremêr û pîrejna danine ser êk.

Tirsa wan ji sinurên mirinê derbaz bibûn. Kes ji mirinê nedtirsîya. Kes ji talankirinê nedtirsîya. Kes ji qirkirinê nedtirsîya. Kes ji girtinê nedtirsîya. Tirsa wan, ne jiwan genc û zelumên li pêş çavên wan bikevir û bilokan kuştin bû...

Tirsa wan ya mezin. Jidestdana namûsê bû. Girêtkirina kiç û jinên wan bû. Namûs, barekî girane...

Lipêş çavên wan, ew kiçên herzekar, ew jinên ciwan. Dibirin û nedzivirandin. Kesê nedzanî kîve birin? Çi lê kirin? Kesê nedşîya pirsîyara wan bikit!

hemüyan divîya, her li gundî. Topek, yan moşek, bi nav mala wan ketiba. he mü pêkve bin ax kiriban.

Neku hosa ketban destên vî dojminê bê dil û bê namûs.

hemü baş dizanin. hemü dojminê xwe baş dinîyasîn. Mejîyên xwe moxil dikin. Dilên xwe dixapînin. hewarên xwe digehînine xwedê.

Ayata dixwînin, navên Şêx û pêxemberan, divehînin. Çu jikesê naêt. Kes litana wan naêt. hemü dixeweka giranda dinivîsitîne.

hîvîya behavêtin. Omêd nezok bûn. Bawerî xiriş bûn.

Banê çînkuyê yê wê hola dirinde. Nehêla, dua û gazindên wan bigehne gohên xwedê. Nehêlan Şêx û pêxember jiber tenîştên horîyên ciwan litana wan rabin.

Mejî ron bû. hizir şêlî bûn. Destên wan, wek lewendyên evînê, şor kirine ber tenîştên wan.

Piştî jidestdana gund û mal û şoreşê. Piştî jidestdana zelaman. Piştî jidestdana her tiştî. New gera jidestdana namûsê hat....

Namûs barekî girane....

Dengê jinekê, rengê hemüya jitirsa zer kirin.

_ ey heware... Çar kurên min birin, mêrê min birin, babê min, sê birayên min....

Kiça wê ya mezin got.

_ tu bêjî hêlabine sax?!

Jineka, du kur û mêr û sê bira û deh pismam lê birîn got:

_ bawer neke. Yê bisaxî binaxkirîn. eve ne mirovin.

Dengê jinekê bilind bû, kesê jitaryê dêmê wê nedidît:

_ kuştin bo mêranê. Xema giran namûse. Divêt em nehêlin van jin û kçan jinav me bidizin.

Axivtin bû ger û nobe.

_ dibêjin, zelum yên kom kirîne di hola heve.

_ dibit. Lê bawer neke dê wan hêline sax.

Dengekî bê omêd got.

_ çu çare nîne?! Qortalibûn nîne?!

Gelek deng a gotin:

_ heker xwedê jiesmana bête xwar û pirsîyara halê me bikit!

_ kuştina zelaman li serekî...Birina van kiç û jnan liserekî...

Deng jihinavên wê bû birûsî.

_ ey hewar... Xwedê ma tu menabînî...?!

Kes nema nivîsitî, hemü hişiyarkirin. ew zaroyên jibirsa xav bûyn û nivîstîn. hişîya bûn. ew nesaxên jibê omêdyê xwe dixew birîn, hişiyar bûn.

her kesê goh liqêriya wê bûy. hest kir, gera wîye bo mirinê. Kiçên sinê, jinên ciwan. Tirsê spî kirin. Çavên wan man lidestekî reş, milên wan bigirt û bibite cihê nezivirînê. Cihê kirêtkirinê.

Jîyanê hest kir, eve hatin azad jiber tenişt a wê bibin.

Deng û qêrî û hewar. Tijî holê bûn.

Xew û xewin. Bûne rastî. Rastî, xewneka dirindeye.

Serbazgeha selamyê.

(roja duyê)

Spêdê, berî ronahîya rojê bête holên tijî kelexên jin û zaroyên birisî.

Reşekên dojminî hildane jor. Carekadî, koma wan têkvedan. Bi pestal û qontaxên çekên xwe, liherzekar û zelumên liser xwe gerîyan.

Jîyanê, hevalê xwe azad, baş dinav kirasê xwe da veşart. Dersoka wî biserserîda bire nav çavan, kire dinîva xwe wî û xoşkên xweda.

hemüya pêkve kirine qêrî û hewar. Digel qêrî û hewarên wan jin û daykên zaroyên wan birîn têgel bûn.

Mirovxwêran şîyan, têra têştâ xwe zelama bibin. Cih bû dozex, gîyanê gelek daykan û jinan. Bilind bû banê holê yê şarîyay.

Jitirs û jigerma cihî. izrayl ne diwêriya xwe nêzikî holê bikit.

ew gîyanên dinavbera leşên bê omêd û banê çinkuyê yê holê. Dimane hlawîstî.

Bêhna xwedê teng dibû. Ferman da milîyaketan. Biçine harî izraylê bê desthelat.

Piştî vê carê jî, hidek bo mirinê birîn.

Dîsan derê holê lê girtin. Roj, revî. Ba jihinavên wan hate dizîn. Okscîn bo jehir.

Lirexê dî yê serbazgehê. Lihidek holên taybet. Xwîn jibin dîwarên hola diza.

Mirinê şerim jinavê xwe dikir. hindek kar dihatine kirin.Nav nebûn pê nav bikin.

Zelam yê gazinda jiizraylî dikin.Da lezê likarê xwe bikit.Gîyanên wan yên bû leşên wan bûyne bela. Leşên wan yên bû hizirên wan bûyne bela. hizir yên bûyne pêlên agirî, şanên mejîyê wan disojit.

Tilên xwe diheşandine digohên xwera. Da goh liqêryên jin û kiçên xwe nebin.

evro, hizar, izrayl livî cihî kom bûyne .evro, xwedê dinîya hemû jibîr kirîye .evro, jîyan lihemû dinîyayê rawestîya ye.

Kes namirt, kes nabit, kes nesax nabit, kes, jimala xwe dernakevit.

hemû hez û fermanên xwedê, livê serbazgehê xerc bûn.

herçendekê, hindek zîlên leşkerî, wan kelexên jiber lêdan û qotanê gîyan jidest dayn. Dibine cihekî nedîyar û bidizîve bin ax dikin.

her zîlên leşkerî kelexa dibin. her mêvan zêde dibin. Cih teng dibit. Xwarin kê m dibit.

Jîyanê xwe kire qormik dikoşa azad da. Liber tenîştâ wî xwe dirêjkir.

Gelek sebira wê dihat, bêhna wê fireh dibû. Çavên xwe niqandin, kiras û vîstanên spî diber xwe dîtin.

Azad destê wê girt. Kêşa ber tenîştâ xwe hîzara wê li ser serî rakir. Maçek li enîya wê da. Xem û nexoşiyên dinîyayê jibîra wê birin.

Wê jina bi rex jîyanê ve nivîstî.Piştâ xwe da piştâ jîyanê û palda.

Sîngê jîyanê, kete sîngê azad. Çavên wan ketin êk. Lêvên wan pêkve man. Jiber cihê teng, jîyanê destê xwe bu azad kire Balîfk.

Nîva memkên wê dîyar bûn. Azad har bû. Xwe qolpande ser tenîştâ dî.

Çavên dayka jîyanê di zîq bûn. Neşîya li ser piştê xwe gelek bigirt.

Neçar bû, çavên xwe, êxistine, çavên jîyanê yên mê. Jitirsa, şerim jibîr kir.

Jiber cihê teng û jitarîya cihî û çivêlyên jîyanê. Destên wî diketine nav memkên jîyanê da.

Jîyanê xwe dixew dibir. Taybet, dema tenîştê wê dikete dinavrana azad da. Leşê wî har dibû, tenîştê jîyanê digezand.

Jîyanê destê xwe dibire cihê mêrannîya wî ya har. Azad tore dibû. Xwe dût dikir. Piştê xwe didayê. Lê jitirsa xwîşkê jîyanê ya biçûk wî aşkira bikir. Careka dî çavên xwe diêxistine sîngê jîyanê.

enîya xwe dikire girê.

_ tu carekadî we bikî. ez dê xwe aşkira kim. Dê xwe dime destên van gawiran.

Jîyanê destê xwe bidevî vena.

_ hişbe, dengê xwe bilind neke. Sozbit wenekim.

Bi dû çavên mê û fêlbaz.

_ tinê min divîya bizanim ka ew çi mar bû ranê min digezand?!

Girêyên enîya wî stor bûn. Çavên wî sor bûn.

Kenîya jîyanê mêyatî jê dihat.

_ xwe toreneke .ez yarîya dikim.

_ eve ne dem û cihê van yaryên çivêle.

_ ez çivêlim yan marê dinav ranên tedir!Ma demê wî ye hosa harbûy?!

_ min çi got?! heker dê xwe hosa çivêl kî. eve ez çûm. Bila min jî wek hemû zelaman bibin û berze bikin.

_ min çi ne gotîe. Xwe ture neke. Êdî ez yarîya digel te nakim. Binive... Dê wastyêy.

_ mane bûye roj? ez bi şev nanivim, dê çewa bi rojê xewa min êt?!

_ şev û roj, wek êkin. Cih her êke. Û paşeroj jî, ez bawerim yadîyare!

_ mirina bi serferazî xoşe. Mirina bi hovane, kafir nebînin.

_ dibêjin, zalam hemû kuştîne û berzekirîne!

_ dê mejî kujin. Lezê neke.

_ kuştin gelek xoşe. Kirêtkirin nekarê mirovane.

_ dê me kirêtkin û paşî kujin. eve ne mirovin. eve dirindene...

_ hişbe, dengê xwe nizim bike. Dayka min ya hişiyare. Bila goh lidengê tenebit.

Çavên xwe niqandin, tijî sîngê xwe bayê genî kir û bihêz berda.

_ çi hat serê min? ez ji van gawira ditirsim. ez jidayka te ditirsim. ez ji te ditirsim. ez ji kirasê te ditirsim, ez ji xwe ditirsim....

Berê xwe da çavên wî.

_ û bo tu jimin ditirsî?

Çavên xwe ji çavên wê vekirin.

_ tirsî ji hemüya mezntir jiteye.

_ wey hewar! ew jibû çi?! Jiber çi tu jimin ditirsî?!

Wek pîremêrekî şareza, serê xwe hejand.

_ tu kiçeka ciwan û herzekarî. Û ez jî wek te herzekarim. ez ditirsim, em toşî şaşîyekê bibin, û...

_ û çi?! ha?

Bê deng bû. Milê wî jina memkên xwe îna der.

_ em nezaro ne .em baş dizanin ka em diçi seruberî dane.

_ raste, lê em bi şev û roj li ber teniştê êk dinivin. em pêkive diçine destava, em linik êk xwe bêstare dikin. Û niza... ez gelek ditirsim...!

Bi du çavên tijî hîvî û bawerî.

_ ez natirsim. Min bawerî bi xwe heye. Û bi tejî heye.

_ supas, lê min bawerî bite nîne .ez dinav pîstê xweda helîyam. ez dinav kirasê teda mirim...

Kenî, kenîya wê serinca dayka wê kêşa. Rabû ser xwe ,enya xwe li wan kire girê.

_ ew çi kenîya bê şerme? Û ew çi pist piste hûn dikin?! Ma hûn şerim nakin? Ma eve cihê van çivêliyane?

herduwa serên xwe dane êk û bê deng bûn.

Jîyanê zanî dayka wê zivirî cihê xwe. Devê xwe bire bin gohê azad.

_ min çavên te didîtin, dema em çûyne destavê. Berê te ji ranên min venedibûn.

Azad rabû ser xwe, berî dengê xwe bilind bikit.

Jîyanê destê xwe havête devê wî.

_ hişîş, dengê xwe bilind neke .ez yariya dikim.

_ Mamin negot, yaryên çivêl neke.

_ bibore, min nezanî tû yariya nizanî! Yan te nevêt li nik me bimînî?!

_ ez yariyan dizanim û min negotîe ez li nik hewe Namînim. eve nedem û cihê yariyane û taybet yaryên hosa bê mana û direw.

Bê deng bûn, azad hest kir, dilê wê hêla.

_ ez çucara qencîya te jibîr nakim. Te jîyana min rizgar kir.

_ ew erkê min bû. herkesê licihê min ba, da we kit.

_ supas..

_ supasî pê nevêt.

Serbazgeha selamyê.

(roja dawîyê)

Jidestpêka vê şalawa dirinde. Şerek dijwar dijî mirovan, dijî gîyaneweran, dijî gîya ü çîya ü kanî ü rûbaran, dijî rê ü pir ü kevir ü beran. Dijî çîya ü tiraşan. Dijî her tişteke liser axa vî welatî bû.

Şerê nehêlana nifşekî bû. Şerê qirikirinê bû.

Gund ü bajêr valakirin ü sotin. Deşt ü çîya, ketin bin kuntirola leşkerî. Rengê jîyanê pêti bû. Bêhna mirinê jiparyên nanî dihat.

ew gîyanên izirayl negehiştî bibite esmana. Liserbazgeha selamyê komkirin.

Liwan çend rojên liserbazgeha selamyê bûyne mêvan. hemü hişik bûn. Girî ü Nalîn jikesê na êt. Livîn ü gazinde linik kesê neman.

hemü dinav cilkên xwe yên pîs ü dirîyayda bûyne helamet.

Pîstê wan yê zer bûy. Çavên wan diserî da zîq dikin.

evro, reşekên dojminî nehatine ser kelexên wan. Piştî gelek caran têkvedayn. Piştî çu zelum ü zaroyên deh salî nehêlayin.

Piştî, kiçên sinêla ü jinên ciwan, jê girtin ü birin.

Piştî zaroyên biçûk jibirsa û nexoşîyan kitkte mirîn. Piştî birîyara mîrî bicih înayn.

(jizaroyê deh salî, heta pîremêrê hevtê salî)

ew kelexên jin û zaroyên nîv mirî, linîva gorepana serbazgehê komkirin.

Roja dijwar, lihindav serên wan yên hişik. Wek bizotekî agirî bû.

ew gotinên bîyanî yên liser wan dihatine xwandin. Wek gulleyên topan bûn. ew enyên girê, ew dêmên hov û çavên sor.

Çend çipkên xwîne dipaşîya dilê wanda mayne ,hişik kirin.

Ser efserekî reng meymûnik.Linîva wan rawastîya, kaxezek jibin kefsê xwe îna der.

Bi dengê xwe yê hovane:

_ birîyar...

Serkirdayetîya şorhişê birîyara lêburîne da.Lidûv birîyara şorhişê. hûn hatin azad kirin.Vê carê jî, gîyanê hewe rizgar bû. Divêt hûn supasîya serkirdayetîya şorhişê bikin...

Pîrejneka, mêr û heşt kur û kiç û şeş bira û gelek pismam lê berze kirîn.kire hewar û got:

_ ka zelumên me...?! Ka kiç û jinên hewe dizîn?! Ka....

Du sê reşekan xwe lêdan. Pirça wê ya spî girtin û rakêşane nîva gorepanê.

Çavên zîq, devên beş, berevanî jê dikirin.

Ser efserê çav sor, pestala xwe dana ser serê wê yê tijî serbor:

_ kes basê wan nekit, yê sax dê gehte hewe, yê mirî, hûn dê êk û du li cehnemê bînin. Înşalla...

Kesê hêz nebû, bikite hewar, kesê şîyan nebûn xwe nerazî bikit.

Dengê zîlên leşkerî, hişên hideka azirandin, liser milên xwe zivirîn, çavên wan jiserî derketin.

Deng nêzik bû, gorepan libin pê n wan hejand.

Dengê ser efserê çav sor, biser dengê zîlên leşkerî ket:

_ karê xwe bikin, dê hewe bine cihekî baş, hûn dê jîyana xwe ya mayî, liwî cihî derbazkin, herkesê nerazî, her kesê ji wî cihî dûr bikevit, dê dawîya wî reş bit, wek dawîya xwefiroşan.

Jîyanê, azad yê daye pişt xwe. Xwîşkên xwe û dayka xwe, wek kotanê lidor kom kirîne.

Dinav kiras û dersoka da pêçay. Bêhna wî ya teng dibit. Gerim û toz û wan enyên girê û wê dersoka seruçavên wî veşartî.

Çu nemaye dê kite hewar. Dê bêjite hemüya, ez azadim, ez ne kişim, ez kurim, ez zelumim û dê xwe dienî girêyekî werkit, dê çekê wî jê sitînit. Dê li koma wan reşînit û paşî dê xwe kujit.

Destê jîyanê jidestê wî venebû, çavên wê yên rhiş ji çavên wî yên şîn venebûn. Agedarî û amojgarêyn wê jigohên wî dûr neketin.

Dojminê har, zimanê req û bîyanî, bê desthelatî liserekî, hewil û dilovanîya jîyanê, liserekî.

_ heker te bivêt tola van bêgonehan vekî, bêhna xwe fireh bike. Roja tolivekirinê nêzîke.

Destê xwe didana ser sîngê xwe yê çarde biharî.

_ jiber xatira min. Bêhna xwe fireh bike.

Xwe kire qurmik dinav kiras û dersoka xweda. Yarî bilewidîyên xwe kirin.

Turmbêl nêzîk bûn, ew bûne rêz, wek pezên spî, heşandine diwan zîlêl leşkerî da.

Qêryên bê omêdên hindêk gewrîyan. Nîşana berxwedanê jê dihat.

hemüya hizir dikir. Dê wan jî bine başorê îraqê, wek ewên berî wan birîn û kes jê nezivirî.

Berê zîla kete bakor. Tijî hinavên wan yên vala û kul bayê hûn bû. Bawer kirin dê çed rojekên dî jîn.

Ji ber cihê teng, jîyanê dikuşa azada xwe mit kirîne, azad, jiber kiras û wê dersoka distoy, yê şerê mirinê dikit, gelek caran dayka jîyanê digotê: Wê dersokê sist bike, tu xendiqî.

Jîyanê digotê: Jê bigere, diyare bo wê wesa xoştire.

Gelek caran, azad hest dikir. Dayka jîyanê rastîya wî dizanit.

Mûyên simbêl û rîhên wî diyar dikirin. Lê zeratîya mûyan û pora wî ya dirêj gelek diharîkar bûn.

Wek kiçeka por zer xûya dikir. Jiber şer û nexoşîyan û nebûna portiraşan li gundî. ew demekê dirêj bû pora xwe netiraşî.

Jîyanê gelek şeva, yarî bi pora wî dikirin, gelek caran bo kezîk divehandin,
gomana dayka xwe bin ax dikir.

Toz û pîsatî, harîkar bûn. Sîmayê wî veşêrin.

hemüyan, jinavçavan ve, wek êk xûya dikirin, reş û spî, ciwan û kirêt. Pîr û law.

Wek hemüya, azad reş û tozkewî û pîs, dinav cilkên qirêjî û dirîyay da, berze
bûbû.

Azad baş hatbû veşartin.

Cêjnîkan

Zîlên leşkerî, dinîv şeveka tarîda, hemü wek gilêşî radane deşteka pirî stirî û qesel.
Litenîştta gundê cêjnîkan. ewê dikevte nêzîkî bajêrê hewlêrê.

Berî wan, tijî gundî enfal bûyên Barzanî kirbûn.

ew dever bûbû cihê paşmayyên enfalan, ewê ji enfalkirinê rizgar dibû, liwê deştê
kom dikirin.

Tarî û stirî û dûpşik ü mar, bûne hevalên tirs û pirs û dojminê har.

her çendekan, wek pezê gorg dîtî. Bi cihekîve revîn. heta wastîyayn.

Neçar bûn, serên xwe dane êk û dicih da bûne peyker.

Jiber stirî ü pûşî û mişk û maran, kes nedişîya rûnit. Kes nedişîya bilivit. Kes
nedişîya bigirît.

hemü jipîyave wek spîndarên av liser girtî, hişik mane rawestîyay.

her zû. Leşên bê hêz, gehên bê xwîn, zikên birisî, hemü kirine kelexên mirî û
berdane dinav wan stirî û dûpşkanda.

hest bi çu nedikirin, ew stiryên dijwar, teniştên wan digezandin. Xwîn hişik bûbû,
hest nemabû. Dilên wan jibirisa kar nedikirin.

hemü lihîvîya mirinê, dinav kotaneka leşkerî da diamade bûn.

Mirin giro bû. Leşkerî, lidorên wan cihên zêrevanyê dirust kirin. Zanîn ev ware, dê
bite cihê wan bû demekî dirêj.

Xodan serboran, cihîn xwe xoş kirin, bêhna wan fireh bû. ew bayê jideşta hewlêrê digehişte mejîyên wan. Bêhna gund û çîyayên wan jê dihat. Dibû hêz bû dil û gîyanên wan yên lawaz.

hêdî hêdî, çavên wan cih dîtî. Bi dest û piyan stirî dimalîn. Cihên xwe xoş kirin. Xew tijî leşên wan bû. Bûne kelex.

Ne stirîya û ne dûpşkan, şîyan wan kelexên mirî hişîyar kin.

Tinë izrayl, her çedekê dihate hidav koma wan, gîyanê zaroyekî, nesaxekî, birîndarekî. Dihilkêşa. hemû ji xew hişîyar dikirin. herkes libenda gera xwe yê amade bû. Cih ron bû, deng kêmbû. Berî bibite roj. Cihek bo gorstanê dest nîşan kirin, zanîn, wek gund û bajêrên wan yên gelek ji goristanên wan biçûktir, ev goristane dê gelek jivî warî mezntir lê êt. Gelek bizav kirin heta semta qîblê zanîn. Bê şûştin nivêj lê kirin. Miryên xwe bin ax kirin.

izrayl jîhidav serên wan naçit. Kes nizanit likîveye? Kes nizanit dê çi ête serî!

hemû lihîvîya gera xwene bo mirinê, hemû libenda izraylî ne, kes jimirinê natirst, kes ji ber iziraylî narevit.

Jîyanê, azad yê kirîe dinavbera dayka xwe û xwîşkên xwe da. hemûya serên xwe dayne êk, jitirs û taryê, kes çu nabînit. Kes çu nizanit. Kes çu hizira nakit. Kes çu hesta nakit.

ew deşta mezin û berfireh, tijî mirove. Piştî jîtirsê bê hîvî bûyn. Piştî iziraylî bêhna xwe înay. Xwedan ceger, wek diza li nav wan komên mirovan gerîyan, pirsîyara mirovên xwe dikirin.

Kes çu bersiva nadit, kes çu hesta nakit. hemû kelexin, lihîvîya birîyara nemana xwene.

ew pîremêrên xwedan serbor, jîtirsa newêrin binivin, newêrin bimirin. Newêrin çavên xwe danine ser êk.

ew pişt rast bûn, zelumên wan çûn, kes nazivirt, hemû bisaxî binax kirin, tijî guhên wan, hewar û qêryên wanin. Tijî mejîyên wan, bêhna xwîna waye.

ew baş dizanin. eve dojminekê har û bê namûse, şerê wan yê qirkirinê ye, şerê man û nemanê ye.

ew baş dizanin, piştî zelaman, dê gera kiç û jinan êt, serbor û tawanîn berê, diserê wanda, dibûne filmekê sînemay. enfalên berî wan, li pêş çavên wan bûn, xew nema, pist pist, zêde bû, jinên dilşêr, ligel pîremêrên liber mirinê. Zêrevanî likiç û jinan girtin.

Jîyanê wek kora, destê xwe dirêj kire rexê azad lê nivîstî.

_ tu nivîstî?

Azad wekî wê dengê xwe nizim kir.

_ ma dê çewa xewa min êt?

Milê wî girt, kêşa nik xweve.

_ were nik min, dersoka xwe veke, şeve kes te nabînit.

Digel destê wê çu, sîngê wî bi sîngê wê ve ma.

_ ez jidayka te ditirsim.

_ netirse, wê ageh ji te nîne, ya nivîstî.

_ bawer neke ew binivit!

Devê xwe bigohê azad vena, tijî difina wê bêhna xwha leşê wî bû.

_ êdî ez natirsim, em û mirin jêk xilas.

Azad nevîya difina xwe ji nav kezyên wê yên bêhna qirêjê jê difirî bînte der.

_ mirin her dê digel mebit, hidî zêrevan lidurên mebin.

Jîyanê xwe kire dinav sîngê azad da. Devê xwe dana ser rüyê wî yê hindek müyên tijî têra xûya.

_ binive... Sube dê rojeka dirêj bit.

Dengê xewê ji axivtina wî dhat.

_ hemû şev û rojên me dê didirêj bin.

Xwe pitir nêzîkî êk kirin. Liser erdê req û di nav stirî û pûşîda, karê xewê kirin.

Xew dirindeyekê hare, ne tirs û ne birs û ne cihê wan yê tijî stirî û dûşîk. Şîyan leşîn wan yên wastîyay, jînav pêlên xewê rizgar bikin.

Xav bûn, dengê xewê ji gewryên birsî hat. Xwha memkên jîyanê, azad serxoş kir, leşê wî xav kir. Wek kengirpera ligel bayê dijwarê xewê bilind kir...

Azad serê xwe bilind kir, babê wî, destê xwe dana ser serê wî û çemand.

_ xwe nizim bike, dojmin yê nêzîke.

Xwe berdane dinavbera du kevranda, xwe veşartin.

Dengê çekê sivik, nêzîk dibû. Agir jidar û beran bilind dibû.

Babê wî zanî, xilas nabin, berê xwe da enîya azad ya tijî tirse.

Destê xwe dana ser milê azad.

_ azad... Tu here xwe xilas bike ,ez dê paşî gehme te... Dê hiloo, me dem nîne...

Azad, berê xwe da navçavên babê xwe, tijî xwh û kerbe.

_ ez te nahêlim.

Babê wî lê xwrî..

_ here te çu pê çê nabit bo min bikî, tu dê min dîye girtin, dê hiloo xwe giro neke ,eve hatin.

Rabû ser xwe, dengê xwe bilind kir.

_ ez te nahêlim pişt rast be, û...

enîya babê wî tijî kerb û tirs bû.

_ ser req nebe, nedemê van çivêlîyane ,eve hatin.

Dengê peqînekê jinêzîk hat, herdu ditozê werandin.

Babê wî xwe havête ser kelexê wî.

_ azad...? Çi li te hat? Tu yê bisilametî?

Dengê azad jina toz û dükêlê bilind bû.

hemüya pêkive destên xwe vekirin û fatîhe xwandin.

Piştî hemü jipistpistê xilas bûyn, melay got:

_ eve hûn bûne jin û mêr, daxwaza jîyaneka xoş û komeka kur û kiçan bû hewe dixwazim.

Mela rabû digel herdû şahidan û çûne derê, Mamê wî digel mêvana derket. Û zû zivirî.

_ da bû hewe bêjim, eve hûn bûne jin û mêr, lê hêşta gelek liser hewe maye ,hûn xwedan du xwîndarin, dojimin û mala babê jîyanê, xwe biparêzin heta xodê rêyekê liber me vekit.

Derketin nîne, dergeh vekirin nîne, ronahî nîne, têkilî nînin, nabit kes bizanit hûn yên livê jorê dijîn.

Bêy pîrozbahîya wan bikit, liber dergehî rawestîya û got:

_ ez dê her çend rojeka ême seredana hewe û dê pêdivyên hewe ligel xwe înim, dergehî bo kesê venekin.

Dengê girtina dergehî, diserên wan da deng veda.

Liwê jora tarî, ewa bûye zîndan û mala wan, çavên wî ketin bejna jîyanê. jinmama wî hindek cilkên ciwan û biseruber kirbûne ber jîyanê, rengê bûka dida. Serê xwe bilind kir, çavên jîyanê tijî rondikin, destê xwe havête rüyê wê.

_ çîye? Tu bo digirî?

Dêmê azad yê zer bû, xew ji çavan dibarî, jîyanê destê wî jiser rüyê xwe bire lêvên xwe û maçî kir.

_ wesa dîyare hatina me ne bidilê mala Mamê teye.

_ nene, tinê ew ditirsin, em bêne girtin. Û..

_ ü çî? ha?

Da ber sîngê xwe û şidand.

_ ji mirovên te ditirsin.

Jîyanê nevîya ji ber sîngê azad derkevit.

_ mirovên min hizira kuştina me nakin, min çu mirov nemayne sax, heta lime bigerin...

Destên xwe havêtine rüyên wê, çavên wan ketin êk.

_ xwe tore neke ,eve ew bû ya tedivîya...

Bi çavên tijî bişkurîn...

_ ma tejî nedivîya?

Maçek lienîya wê da.

_ belê min jî divîya.

Sîngê xwe vekir, jîyanê xwe havête dinavda.

_ were ,ez gelek yê jite xerîb bûym, eve çend şeve ez binê dinivim.

_ ez jî bo te sotim...

Şidandina wan gelek nema, jîyanê xwe da paş, berê xwe da bejna wî.

_ tu dizanî, kirasê min pitir jibejna te dihat, ji van şel û gumlkan.

Xwe havête ser kelexê wê, girêl kire ser erdî.

Devê xwe havête devê wê, destê xwe havête xilfa doxîna xwe û vekir.

_ ez û kirasê te jêk xilas, nihu dê kirasê te jî jiber tekim, dê te hêlme rûs...

Kenîya wan, tijî wê jora tarî bû, bêy dewat û şehyan, bêy dehol û zirina, bêy heval û xwandî...

Di wê jora biçûk ve bûne bûk û zava...

Xewnên dirinde

dîwarên jorê dihatine êk, ban nizim dibû, erd bilind bû, pêlên tarîya şevê, sor dibûn, dibûne rengê xwînê, ew çend firên bayê gerim û genî yê dijorve dibû jehir. Lihêfa kevin û dirîyay, dibû daralînîk, doşeka req dibû sêla sora agirî.

efserekê lêv doqîçik, destê xwe bidevî vena, bêhna wê teng kir, çu bizav û livîn jê nehatin, çav lê zîq bûn.

Du serbaza milên babê wê girtin, jinav koma wan rakêşane der.

Linîva hewşa kelha nizarkê, piştta wî danane erdî, destên wî kirine dibin pestalên xweve. Pên wî girêdan.

efserek çu hindav serî, hindek pirsîyar jê kirin.

Babê wê tif kire enîya efserî, efser kenî, kenîya wî awazên ayeta(alanfai) jê bilind bû.

hiçkê xwe dîçihê tifa wî da, lipişt xwe zivirî, dest da bilokekî, bilind kire ser serê xwe, jorda berda ser serê babê wê...

Çavên xwe niqandin, nevîya maçkirina bilokî û serê babê xwe bibînit.

Liqeryên jin û biçûkan, wek zaroyeka şermîn, çavên xwe vekirin.

hindek xwîn û mejî jibin patka babê wê dizan, bihemû hêza xwe kire hewar...

_ neeeee....

Azad jinav xewineka kirêt hişiyar kir.

Wê kire hewar û azad, kire hewar.

Azad zû ageh ji xwe bû. Litaryê destê xwe havête milê jîyanî.

_ jîyan...? Jîyan...? Te xêre? Netirse dilê min!

Jîyanê, wek har û dîna xwe havête ber sîngê wî. Recifka leşê wê, tijî hinavên azad tirs kir, ew jora gerim û şarîyay, kire gelîyekî befirîn, azad, dinav sîngê xwe da şidand.

_ netirse, tu ya libersîngê min.

Jîyanê, wek kura, destê xwe dinav taryêda liserê azad gêra, heta binê pîya, destê xwe hêla liser sîngê wî, bêy serê xwe jisîngê wî vekit.

_ hilû, jûrê ron bike.

Azad serê wê dana ser Balîfkî, bezî fanos helkir. Rüyê jîyanê wek kulindekê zer xûya dikir, careka dî hate cihê xwe, serê wê bilind kir, kêşa ber sîngê xwe, du sê maç lienîya wê dan.

_ netirse dilê min, ew xewin bû...

Jîyan hêşta dilerzî..

_ xewina çi ? ew rastî bû, min û hizar kesan biçavên xwe dît.

Dengê dilê azad perda gohê wê digezand, tirsê wê zêde kir.

Serê xwe bilind kir, çavên azad tijî tirs bûn.

_ azad? Tu bo ditirsî? Te xêre?

Azad nevîya tirsê jîyanê zêde bikit, bikenîyeka xav.

_ tirsê çi? Min tu ya hey, ez natirsim, em û tirs jêk xilas.

Gohê xwe dana ser dilê azad.

_ pa bo dilê te hinde xwe diqotit?

_ dilê min? ew jiber dilê teye, yê jidilê te xerîb bûy.

_ rastyê bêje.

_ rastî, te ez tirsandim.

_ rastîya xewina xwe bêje, te çi xewin dît?

_ xewnên çi? Min tu di xewna xweda dîtî û...

_ ez baş dizanim, tu newêrî jiber xewnên kirêt binivî.

Azad şidandina wê liber sîngê xwe sist kir, wê şeva tarî, nevîya çavên wî bikevne çavên jîyanê. Jîyanê, destê xwe dana ser rûyê wî.

_ azad, jimin neveşêre, te çi xewin dît?

Azad piştî xwe dayê.

_ ez yê nivîsitî bûm, min ageh ji çu nebû, te ez hişîyar kirim.

Serê xwe dana ser Balîfka req, karê xewê kir.

_ binive, çu hizira neke, wê fanosê kêr ke, yan vemirîne...

_ ne, bila ya geş bit, xewa min naêt.

azad çavên xwe neqandin, mejîyê xwe givaşt, kasêta xewina wî ya berî qêrîya jîyanê kete karî.

Lichê destavê, ligirtîxana selamyê, serbazekî enî girê û lêv doqîçik. Pora kiçeka sêzdesalî girt, jinav koma jina bire der, lipişt dîwarekî, kirasê wê diberda dirand, sîngê wî yê biçûk daberleqan, hewarên wê gehştine dîwana xodê.

Kes litana wê ne çu, kes lê nebû xodan, piştî wê ya nazik, dana ser wê çîmentoya şarîyay, xwe havête ser sîngê wê yê zarokîni, azad û gelekên dî, desitîn xwe biguhên xweve şidandin, da dengê kirêtkirina wê ne gehte guhên wan. Jiber berevanî û qêryên wê, zavay, destê xwe bidevî ve şidand. Nehêla hewara wê bigehte çu serspîya. Digel vizka xwîna jinavrana wê derketî. Gîyanê wê, bilind bû esmana.

Zavay, penteronê xwe yê leşkerî bilind kire navka xwe, pora wê ya dirêj, didestê xweda werbada, kelexê wê rakêşa cihê gilêşî...

Azad, neşîya xwe bigirt, bihemü hêza xwe, kire hewar....

Jîyan jinav pêlên tirs û hizira hişîyar kir.

_ azad...? Texêre?

Wek biçûkê jisîbera xwe ditirst, xwe dibin lihêfa xwe da veşart, şev dirêj bû, jor tarî bû, dîwarên jorê hatine êk, banê jorê nizim bû.

Dengê kenîya efseran, jipitpita fanosa wan dihat, ronahîya fanosê, efser liser dîwarîn jora wan dinexşandin. Tirs tijî pîstê wan bû.

Xwe havêtine êk û ji dil girîyan.....!

hîvîyek ji kûratîya tarîyê

Pitir neh heîvan. Bişev û rojên wek êk, reş û tarî.

herduwa diwê jorê ve borandin, bêy dergehê jora xwe vekin, bêy kesê bibînin, bêy digel kesê baxivin, bêy kes bibite mêvanê wan, bêy bibine mêvanên kesê.

Çavên wan fêrî taryê bûbûn, demên rojê jibîr kirbûn, navên roja nedzanîn, hest bi werzên salê nedikirin, dema jor gerim dibû, liber wan dibû havîn. Lisermayê, bêrîya befirê dikirin, bihar nêzikî jora wan nedibû. Gelek sebira wan bi wê fanosa pitpitî dihat.

ew jora biçûk, liber çavên wan bûbû gorepana werzşî, gelek caran, şer û yarî û xwelêkdan têve dikirin.

Qulaçek kirbûne serşû û cihê destavan, qulaçek cihê nivîstina wan bû, qulaçek cihê xwarin û navmalîya wan bû.

Sihên wan fêrî wê okscêna genî bûbû, ewa diwê jorê ve.

Gîyanên wan fêrî çaverêyan bûbûn, çaverêya wan, hindek caran, nan û hîvî digel xwe diînan.

Çaverêyên wan dirêj bûn, wek şev û rojên wan lêhatbûn, çu guhorîn nediketinê.

Tinë Mamê azad, her çend rojeka dihat, hindek xwarin û pêdivyên wan bû diînan, gelek caran, deng û bas digel nanî bû wan diînan.

her sê dana, tirs û hişîyar bûn, digel nan û avê dixwarin, gelek pirsîyar dikirin, wek aşiqan dimane lihîvîya Mamê azad, ew çavkanîya hîvî û deng û basên wan bû.

Jiber şev û rojên wan ditarî bûn, hindek caran azad jigîyanê xwe tore dibû, linîva şevê, derê jora xwe dida alîyekî, çend gaveka jidêgehî dûr diket, tijî hinavên wî bayê paqij dibû, şanên mejîyê wî hişîyar dikirin, tirs wî zêde dikir, bîra wê kiça lipêş çavên wî kirêt kirîn û kuştîn û wan bilokên lihîdav serên zelaman bilind dikirin û jorda berdidane serên wan yên dixwîné werbûyn dihatine bîra wî, direvî diçu qulaçên tarî yên jorê, xwe dikire qurmik û dilerzî, jîyan ji xew hişîyar dikir.

Çend gildên malê biserdidadan heta hedara wî dihat.

Nihu yê neçare ,eve du şev û du roje, pîrejineka bûye mêvana wan, cihê wan yê teng kirî, ew jora tarî û bê deng, tijî ronahî û suhbet kirîe, gelek xwe wastand, gelek xwe xwîn şirên dikirin. Gelek suhbet û serhatî bo pîrê digotin, bêhna pîrê, herîya teng bû, gazindên wê zêde dibûn.

Azad neçar dibû, hindek rûdanên kirêtên selamyê û yên kelha nizarkê bo pîrê vedgêran, dibû axîn û Nalîna pîrê. Berzebûna kur û nevyên wê lê nû dibû, pitpit û gazinde jibîr dikirin, şev her dirêj dibin, roj her bêhteng dibin, jora wan her ya teng dibit, tarî çava dihinît...

Pîrê destê xwe dana ser zikê jîyanê, jîyan ya dinav xweh û janada sor bûy, dîwarên jorê jidenga xerîb bûyne, jiber qêryên wê dilerzin.

Şev tarî bû, jan zêde bûn. Tirs digel bayê sîhên wan têkel dibû.

ew mişkên dibê sepîtkên jora wan ve .eve çend şev û rojin, bê tirs dijîn, biqêrîya janê sê carek jihêlînên xwe ketine bin pîya.

Girîya zaroyekî, tijî gohên wan yên deng jibîrkirîn bû.

Azad, ji keyfa, tirs jibîrkir, jîyanê jîtirsa, êş jibîrkir, pîrê jiber xelatê xwe ,hemû tişt jibîrkirin, dergeh kire taq. Kete ber sîngê Mamê azad. Mizgînî dayê.

Mamê azad, destê xwe kire dipaxla xwe da, devê pîrê beş bû.

Devê xwe bire bin guhî.

_ pîrê... hişiyar be, te kes nedîtê... Te çu kar nekirîne.. Te ageh jiçu nîne... Başe?!

Pîrê paxla xwe girêda, berê xwe da Mamê azad.

_ başe kurê min, ez ne kore û dînim, ez baş arêşa wan dizanim, xodê qeyda wan vekit, pêçûlka wan bi dayk û bab Mezin bibit.

Mamê azad, dengê xwe nizim kir.

_ Azad.. Azad.

Azad, jiber tenîştê jîyanê rabû, destê Mamê xwe maçî kir.

Mamê wî bidengekî nizim got:

_ ser xêrê bit, eve ez çûm, hewe çu nevêt? Çi bo hewe bînim?

_ supas, Mam, divêt pirsîyara jîyanê bikim.

Qesta jîyanê kir, jîyan ya yarîya bitilên kiça xwe dikit.

_ jîyan? Mamê min yê pirsîyar dikit, ka te çi divêt?

herweku jîyan lihîvîya vê pirsîyarê.

_ min şîr divêt, min memik divên, min hindek cilik divên, min... Bibore ,ez nzanîm ka min çi divêt, ew baştir dizanîn ka em pêdivî çine.

Mamî azad, kete pêşîya pîrê, heta serê kolanê.

_ supas pîrê. Mala te ava.

Azad zivirî hindav serê kiça xwe.

_ jîyan...?!

_ çîye dilê jîyanê?!

_ eve kiça mine?!

_ ne... Kiça mine.

Azad berê xwe da navçavên jîyanê, tijî hîvî û bişkurînin.

_ kiça te ye?!

Jîyanê xwe mijûl kir, da çavên wê nekevne çavên azad.

_ erê, min bizorî jite stand, ma ne libîra teye?

Serê xwe bilind kir, tijî dêmê wî keif bû.

_ birastî, te bizorî ji min çê kir, lê nihu ez jî hevbeşim, kiça min jî ye, wek te.

Jîyanê serê wî dana ser sîngê xwe.

_ ez yariya dikim dilê min, kiça teye, beşeke jidilê te, xwîn û goştên tene.

_ supas jîyana min, iha we bêje, da dilê min tenabit.

herdû lihidav serê pêçolka xwe rawestîyan, ji taryê dêmê wê baş nedidîtin.
Nedzanîn rengê çav û pora wê diçewanin!

Girîya wê û pitpita fanosê, tijî jora wan jîyan kirin.

Xew jibîr kirin, xem neman, hizir û tirs kêr bûn, taybet dema her çend demjimêreka, dengê hindek gulleya dihat, hêz dida jîyana wan, hest dikirin dê rojekê jivê jorê der kevin.

Vê carê, dengê peqîneka dijwar hat, dîwarên jora wan hejandin, herdû jikûratîya hizira hişyarkirine ser rastîya jîyanê.

_ eve çi bû?

_ wesa dîyare şoreşê dest pê kir!

_ kes nemaye şoreşê bikit.

_ millet namirin, herdem têra şoreşa mirov dê hebin.

Azad qesta wê pencereya girtî kir, cihê çavên xwe kun kirin, çu nedît.

Jîyan lihidav serî rawestîya.

_ netirse, dê her me jivê kunê rizgar kin.

Kete beranberî jîyanê, çavên wan ketin êk.

_ tu bawer dikî, rojek bê û em jivê jorê biazardî derkevin?!

Jîyanê destên xwe havêtine navtenga wî û kêşa ber sîngê xwe, maçek lienîya wî ya tijî xwh da.

_ ez çucar bê hîvî nebûyme. Û...

Dengê girîya kiça wan, leşên wan jêkvekirin, herdû çûne hindav serê kiça xwe.

Jîyanê bedoşka sîngê xwe vekir, serê memkê xwe kire didevê kiça xweda.

Azad destê xwe havête memkê dî.

_ libîra teye, cara êkê min ev memke dîtîn?!

Jîyanê berê xwe da dêmê wî yê bihîvî.

_ erê, min bixêra xwe nîşa tedabû...

Azad, bikenîyeka bilind.

_ ne ,ew cara duwê bû.

Jîyan lê zivirî.

_ pa cara êkê kengî bû?!

_ ez nabêjim.

_ tu biserê kiça xwekî ka bêje...

_ te got, kiça xwe?!

_ erê kiça te.

_ te navê wê ne got? !

_ ma te navek bo dîtîye?

_ navê wê xema teye.

Wek pîrejineka çîrokbêj, hizirên xwe kirin.

_ hîvî... Ma hîvî nexoş nave?!

Tijî dêmê wê hîvî bûn.

_ hîvî...? em bihîvîyan dijîn, çewa hîvî nexoş nave!

Jîyanê devê xwe bire bin gohê kiça xwe.

_ hîvî... Kiça min, navê te hîvîye ,em dê mînine lihîvîya azad bûnê.

Azad, serê xwe bilind kir, herweku bo hindek mirovên bê hîvî diaxivit.

_ eve hîvîyek hat, ew roj jî dê êt, ewa em lihîvyê.

Dengê girîya hîvîyê herdu jinav pêlên hizira derkirine ser rastyê, qesta kiça xwe kirin, karê tenakirina wê kirin, tijî jor deng bû, tirsaw zêde bû, barê wan giran bû, şev dirêj bûn., roj bitirs ketin,. Jora wan teng bû.

Mejîyên wan tijî awazên girîya hîvîyê bûn....

Şev bitirs ketin

Jora wan ya biçûk, wek kolkê mirîşka xûya dikit, derê wê wek pencereka biçûke, kes nizanit hidek mirov livî cey dijîn.

Birojê, dergeh naête vekirin, bişev hindek caran, dema Mamê azad diêt, lêva derî vedikin, û bilez digirin.

Gelek jorên bivî rengî litaxê berojkê yê hejar hene, gelek kes wesa dijîn, gelek kes lihîvîya sêdarê, yan azadîyê ne.

Taxê berojkê. Taxê hejar û şoreşgêraye, taxekê jibîrkirîe, ne av û ne kareb û ne cadene, taxekê jiyasaya dojminî Derçûye, taxekê, jîdervey kontirola dojminî ye.

Roja nîvro, zelumên dojminî, neşên ligelek kolanên berojkê bigerin.

Bi şev, tax wek devereka azad lê dihêt, jinîv şev pêda, wek mizgînyê, dengê teqêna û tilîlyên kilaşînkofa, guhên dojminî digezînin.

Gelek şeva, hîvîya biçûk, jitirsa van dangan nanivit, azad jikefya nanivit, jîyan jî wastîyanê nanivit.

herdû neçardibin, bê deng dikin, jitirsa hindê bekirokek cihê wan nîşa dojminî bidit.

Teqîna vê carê, gelek nêzîk bû, agir berda baregayekî dojminî.

hîvî gelek tirsand, girîya wê tijî kolanê bû, neşîyan tena bikin.

Dengê qotanê ji dergehê jora wan hat, jîyanê destê xwe bi devê kiça xwe vena, bêhna wê teng kir, eve nêzîkî dû sale, kesê ev dergehe ne qutaye, Mamê azadî, dergehî naqutit, dengê wî û demên hatina wî diaşkirane.

Qutana dergehî bo gazî...

_ kiça min? ew biçûkê te xêre? Bo digirît?

Azad dergeh vekir, jineka sere, liber derî rawestîyaye.

_ biborin, min hûn tirsandin, netirsin, dojmin bişev naête van cihan.

hêşta destê jîyanê yê bidevê kiça wê ve, azad çavê xwe likolanê gêra, kolan tijî mirove. Pistpist bûbû kenî û suhbetên şoreşê.

_ dê we lê bikin, destên hewe dixoş bin.

_ her bijî kurd û Kurdistan...

Azad mêvana xwe hêla liber derî, çend pêngavekan çû kulanê, komeka gencan serên xwe dayne êk.

_ karê xwe baş bikin, dibit divan şevanda serildan dest pê bikit.

_ em dê çawa serhidanê kin? Kê dê harî mekit?

_ tijî çîyay pêşimergene, dê divan şevanda hêne nav bajêran.

_ em libenda wane, da pêkve ji vî dojminî rizgar bin.

Azad, bilez qesta jîyanê kir, mêvan neçar bû, zivirî kolanê ligel koma jin û biçûkan.

_ jîyan...? Jîyan...?

Jîyanê kiça xwe dirêj kire ser cihê wê.

_ çîye azad? Tedilê min qetand? Dengê xwe nizim bike, ev kiçe bi zorî ya tena bûy.

Devê wî beş bû, jikefya nedşîya baxivit.

_ jîyan... em û tirs û veşartin, jêk xilas, tijî van kolanan pêşimergene, dê bite serhildan, dê me rizgar kin, dê...

_ tu çi dibêjî? Ma hindek pêşmerge mayne lidinîyayê?!

_ erê, tijî van çîya pêşimergene, vê carê, millet hemü pêşmergeye....

_ te xêre? Te çi guh lê bûye?

_ were kolanê, biçûk û mezin yê karê xwe dikin, dê bi ser baregayên dojminîda girin, were da biçine derê, were, netirse...

Destê jîyanê girt û kêşa derê.

_ raweste azad, em xodan dojminin.

Azad qesta kolanê kir, jîyan bidûv xweve dikêşa.

_ kesê ageh jime nîne, dojmin yê bûye rûvî, ew ji me pitir ditirst.

Jîyanê destê xwe yê dî danaye bin zikê xwe. Bi zorî lipêy azad dibezit.

_ hêdî, ez neşêm wek te bibezim, ma tu zikê min nabînî?

Li serê kolanê gehştine komeka mirovan, hemü dimijûl bûn, çavên wan liwî agirê bibaregayê dojminî ve dizîq bûn.

Jinekê destê xwe dana ser zikê jîyanê.

_ evê dizikê teda, dê azadyê bînit, mizgînîya min litebit...

Çavên jîyanê tijî tirs bûn.

_ netirsin, werine derê, dojmin livî taxî nemaye.

Tirsa jîyanê bû recifk, devê xwe bire bin guhê wê jinê.

_ tu dîzanî em likîve dijîn?!

Jinê destê xwe dana ser milê jîyanê.

_ kiça min, em hemü dîzanin, eve çend sale hûn di vê jorê ve dijîn. Ma em dikorene?

Jîyanê berê xwe da azad, tirs wê bû hêbetî.

_ netirsin tijî kolanên berojkê mirovên wek hewene ,iha eve roja hewe hat...

Gencekî dengê xwe bilind kir...

_ erê roja me hat, karê xwe bikin, agirî berdine dilê dojminî, wek ranîya û kelar ü slêmanyê û hewlêrê....

Dengê şêlkeka tivenga, devê hemüya tijî tilîlî û keîf kirin.

Azad û jîyanê ji tirs wê kirine qurmik û berdane erdî.

Du sê kesa, destên wan girtin, ji erdî bilind kirin, bikenîve gotin.

_ netirsin, eve bo dilê dojminî bû, eve mizgînîya serketinê ye.

Pîremêrekî, liser lêva banî kire hewar.

_ kes nemînte livara, qesta malên xwe bikin, bila divan rojên pîrozda, kes ne ête telaftin.

hemü verevîn, kenî ü keîf ü hîvî ji dêmên wan dirijîyan.

Jîyan ü azad qesta jora xwe kirin, dengê girîya hîvîyê, keyfa wan kire tirs, herdu lihîndav serî rawestîyan.

Keîf ü tirs ü hîvî ü xew ü hizir, diconîyên mejîyên wanda hatine hêran, bûne tiryak, gehên wan xav kirin....!

Jikeyfa xew sil bû

eve çend şeve, xelkê dihokê kes ne nivîstîye. Digel tarî bûnê, guhên wan bel dibin, çavên wan zîq dibin.

Bi roj, linav bajêrî, deng ü basên serhildanê dihatine kirin, serhidan, weku agirê berbûye kuzê her dijwar dibû, her nêzîkî dihokê dibû.

Ranîya... Kellar... Silêmanî... helebce ...hewlêr....

Nîveka welatî rizgar bû.

Bi şev, xelkê dihokê, liser ban ü likolana, guhên xwe bel dikirin, lihîvîya teqeya berahîye diamade bûn, da biser kosp ü baregayên dojminî da bigirin.

Dojmin yê bûye rûvî, birojê serê xwe şor dikit, bişev xwe dikuncên tarî ve vedişêrit, mayê xwe di çu nakit.

Tijî nav bajêrî serbazên ji şerî revîne, tijî kolanan dawalêkerin, dojmin newêrt mayê xwe dikesê bikit. Dihokê ya bê desthelatdare .ew gurg ü mirovxwer bûyne mîhên spî.

eve çend şeve, azad ji wê jora biçûk dihête der, likolanê digehte hindekên wek xwe, guhên xwe didine radyoyê, dilên wan geş dibin, hîvîyên wan nêzîk dibin, serhildan berdewame ,eve hate tuxîbê dihokê.

Tila xwe dana ser kapkê radyoyê ü bilind kir.

_ gelî xelkê dihoka dasinîya... Dihoka xoşmêr ü merda..

Nihu gera heweye, dê rabine ser xwe, dihoka xoştivî jibin zulim û stemê rizgar bikin, dihokê ji patoxwera paqij bikin....

Sereldan jîyane... Berxwedan jîyane...

Şev dirêj bû, xew giran bû, tirs û keif û hîvî. Têkel bûn. hêvênê azadiyê peyda kir.

hîvî dinavbera azad û jîyanê da nivîstîye, azad destê xwe danaye ser zikê jîyanê, hest bilivîna biçûkê xwe dikit.

Dengê peqînekê jinêzîk hat., xew sil kir, çav zîq kirin, guh bel kirin.

Azad, wek diza rabû ser xwe, bejna jîyanê ya bilind, diber kiça wê da, dixeweka giranda bû.

Lêva perda pencerê lada, tijî çava tarîya şevê bû, dergeh vekir, tijî difina wî bayê hûn bû, guhên xwe vekirin, liserê kolanê, komeka gencan lêk kom bûyne, tijî dêmê wî hîvî û bişkurîn bûn.

_ wesa dîyare ev bajêre nanivit. Sund xwarîne, nenivin heta azad nebin...

Qesta koma wan kir, hemü verevîn, karê revê kirin.

_ netirsin, ez hevalê heweme ,ez azadim, cîranê heweme.

Careka dî hemü kom bûn, daxwaza lêborînê ji azad kirin.

_ tu vê nîv şevê li van kolanên çi kî?

_ ez jî wê pirsîyarê ji hewe dikim, hûn vê nîv şevê livê kolanê çi dikin?

_ em li hîvîya serhildanêne.

_ ez jî lihîvîya hewe me, bextê weme. Bêy min çu kara nekin, min divêt ji teqîna êkê digel hewe bim, sozê bidine min!

_ soz bit, lê tu xwedan jin û biçûkî.

_ jiber wan jin û biçûkan, min divêt ez lipêşîya hewe bim.

Şev dirêj bû, dengê peqîna dijwar bû, jîyan jixew hişîyar bû, cihê azad yê vala bû, destê xwe dana ser cihê azad, cih yê sar bû, zanî eve demekî dirêje cih yê bê xwedane.

Tirsê, tijî dilê wî xwîn kir, qutala dilî zêde kir, pîstê wê zer bû.

Qesta derî kir, kes nedît, ber bikolanê çû, kes nedît, likolana çarê, dengê kenîya hindêk gencan dihat, kenîya azad ya xûya bû.

Wekî har û dîna qesta koma wan kir.

_ azad... Azad...

Azad jinav koma gencan derket, çavê wî bibejna jîyanê ya xêl ket, tirsîya, hest bipêjina serbazekî kir.

_ jîyan...! Çi bûye? Tu livêrî çi dikî?!

Jîyanê wesa hizir fikir, nihu serê azad, wek serê babê wê, dibin kerên biloka ve diherişit.

Çavên wê yên tijî rondik, bibejna azad ketin, xwe havête ber sîngê wî û givaşt, girîya wê biser ket.

_ ez ya lite digirim, tu bo bêy min ji jor derketî? Te dilê min qetand...

Tijî çavên wan genca keif û evîn bûn, hemüya divîyan desta bo biqutin, hemüya divîyan, wek wan evînê bikin.

Azad milê wê girt, da berahîya xwe.

_ da biçine mal, dê hîvî hişîyar bit.

Berê xwe da hevala, çavên hemüya lişanogerîya wan bû.

_ biborin, divêt ez biçim, şeva hewe xoş.

hemüya pêkive gotin:

_ şeva hewe xoştir, kerem kin.

Destê jîyanê girt, milên xwe dane êk, berev jora xwe çûn, azad careka dî lihevala zivirî.

_ jibîr nekin, ez libenda heweme.

Jîyanê destê wî givaşt, liser milê xwe zivirî, çavên wê ketine dêmê azad yê geş.

_ çi jibîr nekin?! Tu lihîvîya çî?!

Azad lidor xwe zivirî, kes nedît, maçek lirûyê jîyanê da û da ber sîngê xwe.

_ çine dilê min, ez yê lihîvîya deng û basên serhildanê, me radyo nîne, me ageh jidinîyayê nîne.

Qutana dilê jîyanê zêde bû, lerzik kete leşê wê.

_ azad, min nehêle bitinê, ez gelek ditirsim.

Azad destê xwe havête tenişta wê, kêşa ber tenişta xwe.

_ tu ji çi ditirsî, dilê azad?

_ ez ditirsim, wek babê xwe tejî jidest bidim.

_ netirse ,ew dojmin nemaye yê mirov jê bitirst.

_ tu dizanî, demê biçûk bûna mine. Dibit rojek, heta du rojên dî ez nesax bibim, min kes nîne lihidav serê min bit.

Azad maçek liserê wê da.

_ dê bila kurê min bêt. ez yê lihîvîya wî, ew û serhildan dê pêkive ên....

Jîyan dicihda rawestîya, enîya xwe lê kire girê.

_ min got... ez pêdivî teme. Min nehêle bitinê, halê me besî meye, serhildana çi halê çi?! Ma tu zikê min nabînî?!

Azad serê xwe bilind kir, her weku digel xodê diaxivit...

_ serhildan her dê êt, wek kurê min evê dizikê teda...

destê xwe dana ser zikê jîyanê yê mezin, pêkive çûne jor, hîvî jixew rabûbû, digirîya....

Serhildan jîyane

hîvî dinavbera azad û jîyanê da nivîstîye, destê azad yê rastê yê libin serê jîyanê, destê çepê yê dipaxla jîyanê da. her şev jîyan wesa dinivî, her şev wesa azad qeîd dikit, da bêy wê ji jor dernekevit.

Jîyan jirtirsa û jiber dengê teqeya û jiber janên zikê xwe neşêt binivî, çend carekê xew çavên wê dinivînit, mejîyê wê dibite gerok, kelha nizarkê, girtîxana selamyê, komelgeha cêjnîkan, serbazên jin didizîn, ew bilokên biserê babê wê diketin dibûne mêvanên wê, xwîna dilê wê dibû volkan, gehên nivîstî hişîyar dikirin, destê azad, dibaxla xwe da didît, tena dibû, careka dî, çavên xwe dineqandin, karê xewê dikir.

Xew giran bû, leş xav bû, şanên mejî belav kirin, digel hindêk şanên nivîstî kombûnek sazkin.

Azad yî jîpiştta gundî ber bimal dihêt, destekî xakên gewir liber bejnêne, birnoyeka dar şûşe liser milîye. Kolavekê tîj dinîva dersoka wî da dîyare, şotka wî jikirasê jîyanê ye.

Çavê hîvîyê vê ket, qesta babê xwe kir, kurê wan yê biçûk, rabû ser pîya, divîya ligel xwîşka xwe hîvîyê biçite berahîya babê xwe.

Tijî çavên jîyanê keîf û hîvî bûn, ew jî jipêşve rabû, destê kurê xwe girt.

_ tu hêşta yê dizikê minda, dê kîve çî?!

Kurê wan destê xwe ji nav destê dayka xwe înader, qesta babê xwekir.

Li ber derê kotana pezê gundî herdu ketin ber sîngê babê xwe, azad destên xwe vekirin...

_ heçiyê berê, kezî zerê... heçiyê berê, kezî zerê...

hîvî, berî birayê xwe gehişte ber sîngê babê xwe.

Birayê wê jî, xwe havête di nav koma wanda.

Jîyanê li ber derê malê, çavên xwe bidîtina wan kil didan, wê jî divîya wek biçûkên xwe, xwe pavête ber sîngê azad. Neşîya xwe pitir bigirt, wê jî qesta koma wan kir.

Berî sîngê xwe yê ji sîngê azad xerîb bûy, bikoma wanve bişidînit, dengê firokên şerî tijî guha bûn, lihidav serên wan kirine sîber.

Negehişit xwe veşêrt, neşîya gazî wan bikit, dengê peqîna moşekê, ew tax ji xew hişiyar kirin, dengê stirana şivan perwer jibilind goya dihat...

_ wa hatin pêşmergên me, şal û şepik li bejna wan...

ewên ronîya çavên me, gulên sor bidin destan...

Azad rabû serxwe, destê xwe yê xwh day, ji nav memkên jîyanê îna der, qesta derê kir.

Jîyanê kiça xwe hêla, destê xwe da bin zikê xwe û da bidûv ve.

_ azad, neder keve, raweste...

Azad liserê kolana tijî mirov lijîyanê zivirî.

_ jîyan, dilê min, tu here nik kiça xwe, da netirst, evro, roj roja mine...

_ azad, min nehêle bitinê...

Destê wê libin zikê wê bû, tijî çava rondik bûn.

_ jîyan, ew şeve, dê tola kirasê te vekim, dê tola babê xwe vekim, dê tola babê te vekim, dê tola wan gencên serên wan dibin kerên bilokanive herşîn vekim...

Dengê wî nema, ligel koma mirovan, jorda bicadê da çûne xwarê.

Jîyan hêla dinav pêlên tirs û jananda, jinekê milê wê girt, bire dijora wê ve.

_ xwedê ligel wan bit, netirse, dê zivirt.

Dengê peqîn û şerî dijwar bû, şeva tarî kirine roj. Kes nema dimalve, jîyanê neşîya kiça xwe bihêlit, neşîya jiber janên zikê xwe dûr kevit, nedişîya jîtirsa di jorve bimînit.

Taxê berojkê vala bû, nêr û mê... Biçûk û mezin... Genc û kal.

hemüya qesta baregayên dojminî kirin, her zû, taxê berojkê jidojminî paqijkirin.

Bajêr kete dibin kirintirola wanda, ew barega ü cihên serbazan, xwe dane destên wan û şer nekirin, şer kete ser emna dihokê.

emna dihokê, dikeve nîva bajêrî, licihekî bilind, avahîyekî taybet, kelheka asê, dîwarên bilind, cihên şerî yê taybet, kun û qulaçên tarî, çend zirtek û mêrkujên dojminî revîne diemna dihokê da.

Şer dijwarbû, çekên dojminî û dîwarên asê yê emnê, neşîyan li ber kerb û kîna didilê xelkîda asê bibin. Gencên dihokê, xwe liser dîwarên bilind, havêtine dinav kelhêda.

hinda dîwar kun kirin, sengerên asê, dane ber agirê çekên xwe.

Dengê bilindboya, tijî dilê dojminî tirs kirin.

_ wa hatin pêşmergên me... Şal û şepik li bejna wan...

Tilîlyên daykên şheyda, biser dengê moşekên dojminî diket.

Azad, wek gelek genca, dest vala şer dikir, lipîşt dîwarê emnê gehşte hindek kesan, şer dijwar bû, dojmin harbû.

Milê wî bimilê pîremêrekî ket, çavê wî bibirnoya wî ya dar şûşe ket, tijî çavên wî hîvî û serketin in.

_ Mam... Birnoya xwe bide min. ez dê çime nav hewşê.

Pîremêr, liser milê xwe zivirî, gelek tore bû, nevîya di vê roja pîrozda dilê wî bihêlit.

_ law, ez xwe na dime bihizar gencên wek te ,eve ez çûm...

Wek pilingekî birsî xwe havête ser dîwarî, jorda kete dinav hewşêda.

Şer dijwar bû, azad qesta komeka dî kir.

Biçûkekê sêzdesalî, demanca babê xwe ya dizî, berê wê yê daye dîwarê emnê, çend dikit, nizanit, demanca xwe biteqînit.

Azad milê wî girt:

_ ka bide Mamê xwe, da ez nîşa te bidim.

Biçûkî neviya vê rojê ü vê delîvê jidest bidit.

_ bila didest minda bit û nîşa min bide.

Azad divîya fêlekê lê bikit.

_ bide min, ez dê çime rexê dî, livêrê em kesê nabînin.

_ tu ji kerema xwe nîşa min bide ,ez dê çime rexê dî.

_ tu yê biçûkî...

enîya wî bû girê.

_ dê nîşa min dî, yan hosa biçim...?!

Destê wî yê biçûk girt, demance sûyar kir.

_ iha hosa dê peqînî...

Bêy, biçûk supasiya wî bikit, xwe jiber milê wî havête di nav hewşa emnê da, dengê demanca wî tijî guha bû...

Azid, neçar bû, qesta komeka dî kir, digel tilîlyên jinekê, komeka genca, xwe havêtine dinav hewşê da, çavên azad zîq bûn, mûyên leşê wî tij bûn, neşîya xwe pitir bigirt, dest da çekê gencekî...

_ bibore, dê diye min, ez dê çime rexê dî?

Gencî, enîya xwe lê kire girê.

_ ma tu gelek ji min mêtirî?!

Azad şerim kir, serê xwe şor kir, liçareka dî gerîya.

Wê jina şer bitilîliya dikir, gotê:

_ wek mêra here bo xwe çekekî jidojminî bistîne... Xaxazokînyê neke, şerme...

Azad tif kire gîyanê bindestyê, wek geleka qesta dîwarê emnê kir, xwe havête rexê dî....

Roja tolvêkirinê hat

Li ber dîwarekê bê stare, azad xwe yê kirîye qurmik. Gulleyên kilaşînkufa û yên narincoka û yên arpêçeya, wek gjlokê biserîda dibarin.

Neşêt çu bikit, neşêt xwe bilivînit, şer bidesta nahête kirin, yê maye asê...

Du genca, xwe ji ser dîwarî havête nav hewşê, berê çekên xwe dane cihê şer ligel azad dikir, cih bê deng kirin, berê çekên xwe dane cihekî dî, ew jî bê deng kirin, qesta cihekî dî kirin.

Azad hest kir yê maye lidawîya şerî, berokên şerî gelek ji wî dûrin.

Rabû ser xwe, lipaşmayên şerî gerîya, liber dîwarekî.

Du kelex dîtin, xwe nêzikî kelexan kir, liser zikî, xwe gehande serkelexa, çavên wî bi enîya xodanê kelexekî ket, ew enî hate pêş çava, ewa libabê wî kirîye hewar.

_ nelive...

Babê wî destên xwe bilind kirin.

ew enî, her ya girê bû. Ferman da serbazan.

_ vî dojminî gullebaran bikit. eve xayîne ,eve dojminê şoreşê ye...

Çavên babê wî wek çirayekê ba lê didit. Livî rexî û lirexê dî dizilqutîn, divîya bizanî ka deng dê ji çekê kij serbazî sîngê wî simit.

_ min çu nekirîe ,ez neçekdarim, ez xelkê vî gundî me.

Kenîya xwedanê enyê ligel dengê kilaşînkufan têkel bûn, bejna babê wî girêl kirine binê tiraşekê libinê gelî.

Azad, destê xwe dirêj kire kilaşînkufa birex kelexî ve, kêşa bersîngê xwe ,hest biserketinê kir, çavê xwe linîşanekê gêra, da dilê xwe pê hûn bikit.

Şer dijwar bû, tijî hewşa emnê mirov bûn, xwe gorîkirin bû berîkanê.

Du sê çekdara, licihekî asê şer dikirin. Tijî nav bajêrê dihokê şehîd û birîndar kirin.

Azad, xwe çemand, qesta sengerê wan kir, lezkir, nedivîya kes vî mezarî, berî wî tewaf bikit.

Li hidav serên wan rawestîya. Berê kilaşînkufa xwe da koma wan, tijî hinavên wan gullekirin.

_ eve tola babê min... eve tola babê jîyanê... eve tola wan kiçên hewe kirêt kirîn...
eve tola wan zelumên hewe berzekirîn.

Berê kilaşînkufa xwe da yê dawîyê, tu, tola kirasê jîyanê ewê kirîye ber min.

Berî tola kirasê jîyanê vekit. Deng ji kilaşînkufa mîrat nehat.

Çavên wî ketine çavên efserê emnê, wek wan çava bûn, ewên sedan genc lipêş
çavên wî dayne ber asin û bilokan, her ew çav bûn, ewên kiçên ciwan lipîşt
dîwarên girtîxaneyê selamyê û kelha nizarkê kirêt kirîn. her ew çav bûn, ewên
liser kelexên jina, zelum liser piştê dikêşan û berzedikirin, her wan çava dest da
demanca xwe. Çend gulleyek lidilê azad yê tijî hîvî vala kirin.

Azad ket, destê xwe havête berekî, divîya li wê enîya girê bidit, destê wî sist bû,
destê dî havête kilaşînkufa bê wîdan, kilaşînkuf ya giran bû, neşîya hilgirt,
xodanê enîya girê hate ser kelexê azad, divîya hindê kerb û kîna xwe liazadê
birîndar darêjit.

Berê demanca xwe da enîya wî ya tijî xwh, berî deng ji demanca wî bihêt, selîyeka
kilaşînkufê piştê wî simt.

ew kelexê genî kete ser kelexê azad yê dixwînê werbûy.

Du sê hevala, xwe gehandine ser kelexê azad, serê wî bilind kirin, dêmê wî tijî
hîvî bûn

_ navê te çîye? Birîna te çewaye?

_ ez azadim, pirsîyara birîna min nekin, herin tola min vekin, herin, tijî van kun
û qulaçan zîndanîne ,herin wan rizgar bikin, xwe limin negirin...

_ divêt te bibine cihekî tena, birîna te ya dijware.

_ min bibine nik jina min. Dibit ez ev şeve bibime babê kurekî.

Milên wî girtin, birine derê, gelek kes lê kom bûn.

Şer dijwar bû, dihok azad bû...

Roja mizgînîyan

ew pîrejna eve çend şev û roje lihindav serê jîyanê, hindê jinên dî jî înayne harî
xwe, wek daykeka dilovan, her çendekê diçite serê kulanê, û dizivirt, destê xwe
didante ser serê wê.

_ berojkê rizgar kirin, taxê şêlê rizgar kirin, taxê kuçera rizgar kirin, nihu şere liser baregayê emnê.

Jîyan ya dinav jan û tirsê da xendiqî.

_ ka azad? Azad nezivirî?

Du sê yeka pêkve gotin.

_ kes nazivirt. heta dihokê rizgar nekin. Netirse. Dê zivirt.

Jora wê ya biçûk, ya bûye koçka jinan, hinda milên wê girtîne ,hind pêt wê dipexînin, hind bi av germkirinê ve dimijûlin. hindek tinê deng ü basan bo wan diînin.

herçendekê, janên jîyanê dijwar dibin, hewarên xwe digehînte azad.

_ azad... Ka tû? Çi lîtehat...?!

ew pîrejna wek dayka wê, milên wê perxandin.

_ dê zivirt kiça min, xwedê ligel wan bit.

Tilîlyên jinekê, hemü rakirine ser pîya...

_ tilîlî tilîlîlîlî....

Mizgînîya min lihewe, dihok rizgar bû, dojmin nema, emin hate sotin. Tilîlîlî...

Tijî dora jin bûn, jîyan hêlane bitinê, jîyanê jîkeyfa jan û azad jibîr kirin.

Dengê bilindboyê jîtormbêleka bilez hat.

Sereldan jîyane... Berxwedan jîyane...

Ligel tilîlyên jina û dest qutana biçûkan têkel bû.

Jîyan rabû ser xwe, wek hemü jina, divîya digel wan biçite kolanê, divîya bi tilîlyekê beşdaryê bikit.

Janeka dijwar, tijî nav pên wê goşt û xwîn kirin, bihemü hêza xwe kire hewar...

_ azad....

Piştî çend çirkeyeka. Wê pîrejna xêrxwaz, mizgînîya kurekî dayê.

_ evro roja xêraye, roja mizgînîyaye, welat rizgar bû, xwedê kurek da te, bidayk ü bab mezin bibit.

Pêçolka wê, dana ser sîngê wê, hêşta tijî leşê jîyanê êş û jan bûn, hêşta tijî çava, rondik bûn, hêşta pêçolka wê digirîya, Mamê azad û hindek zelam hatine derê jora wan, jîyanê zanî dê mizgînîyeka dî dinê...

Rabû ser xwe, karê derê kir wê pîrejna liber teniştê, milê wê girt:

_ nabit tu zehmetî lixwe bidî, tu ya nesaxî.

Guh neda kesê, liderê wê jora eve demekî dirêje têve wek girtîya dijîn rawestîya, çavê xwe likolanê gêra, kolan tijî mirove.

Qesta koma wan kir, tirimbêleka pîkem dinav koma mirovanda ya rawestîya bû.

Azad yê dinav alayê Kurdistanê dapêçaye, tijî hidav serî hevalin.

ew patê liser çava rakir, dêmê wî yê spî bû, devê wî bikenî bû, çavên wî hêşta şer dikirin.

Jîyan zivirî jora xwe, sond xwar negirît, dest da pêçolka xwe bire derê, hindî wê pîrejî û gelek jinan hewl dan bizivirînin, jîyanê pêçolka xwe dana ser kelexê azad yê xwîn jê dîza.

_ mizgînîya min lite ,eve kurê teye, dê tola te vekit, wek te tola babê xwe vekirî.

Devê xwe bire bin guhê azad.

_ wek te vîyay, navê wî Kurdo ye. Kurdo azad...

Dengê şivan perwer jibilindboya tormbêleka tijî çekdar hat.

_ serhildan jîyane... Berxwedan jîyane....

Destpêk

4/8/2010

Nürnberg. elmanîya